Xweşk û Birayên Xweşewist!

Bi nave xwe û Kak Celal em pîrozbaya xwe ji bona Civîna Partîya Sosyalista Kurdistan rê dikin. Xweşî û biserketina we daxwazdikin.
Me zor dixwest, ku em li vê civîna we de amadebibin. Rewşa Kurdistanê rê bi me neda. Em ji bona mêvandarîya we zor sipasên xwe pêşkeşdikin.

Xweşk û Birayên Xweşewist!

Li Kurdistana Jêrî de di vê Salê de guhertinên pir gewre hatin kirin. Helbijartin, pêkanina Perlemana Kurdî, Pêkanina Desthilatîya Kurdistanê û dazanîna Dewleta Hevgirtî–Fêderalî ji bona Kurdistanê hatin dîtin. Ev veguhertinên gewre gavên pir giring û mezin di mêjûwa Xebata Serxwebûna Welatê me de didin derxistin. Kêrên wan ne bes tenê ji bona Kurdistana Jêrî dimînin, herwehajî tevaya Xebata Welat û Miletê me li seranserî Kurdistanê de bi van Kêran têtin piştgirtin û mujdeyeke baş û bextiyar ji bona Gihandina Welat û Miletê me di Serxwebûna xwe de dide mizgînkirin.

Xebata me li Kurdistana Jêrî de bi saya Yekbûna me û pêkhatina Berê Neştîmanî bi van biserketinên gewre hate tac û xelatkirin. Yekitîya me nebes li Kurdistana Jêrî de, herwehajî li sersanserî Kurdistanê de pêwisti û bingehekî pêşi ji bona bi serketina me û gihandina armanca Welat û Miletê me di Serxwebûn û Rizgarkirinê de dide hîmkirin; ji ber vê jî Dujminên me PKK li ser me tûj û harkir. Ew ji rê û Berjewendîya Kurd û Kurdistanê hate derketin. Wê Şerekî ne rewa li ser Kurdistana Jêrî de date vêxistin. Me ew serkutkir û pê peymanek date morkirin, ku ew careke din destdirêjîyê ji bona nava Xakê Kurdistana jêrî nema bide dirêjkirin. Em hêvidarin, ku ew dê wê peymana morkirî bide parastin.

Xweşk û Birayên Xweşewist!

Siyaseta me ji nava cerg û hinavên berjewendîya Welat û Miletê me têtе derketin. Em ji dil û can pitşgirtina hemû Xebata Milî li hemû Perçên Kurdistanê didin girtin. Em bi tu corekî destên xwe dirêjî nava kar û barên Perçên Kurdistanêyî din nadin kirin, lêbelê em bi dil û can piştgirtina Xebata Netewê xweyî pereçkiri ji bona Mafeyên wîyî rewayî Milî didin girtin.

Xweşk û Birayên xweşewist!

Rewş û Zîneta Aburîya Welatê me pir dujware. Jiyan li Kurdistanê de pir sext û girane. Em di Tengayeke Aburîyî giran de derbasdibin. Dujmin Kurdistana me bi agirê teng, top, Çekên Kîmyawî û Biyoloçi date kavil û wêrankirin. Bêtir ji 5000 Cî û war, Gund û Bajarên me ji ser rûwê Zemînê date nabûdkirin. Hêjî bi ser vê de jî Welatê me ji alîyê Rêjima Iraqê ve di warê Aburî de hatîye dorlêgirtin û bi ser vê jî de ew ji bal Havgirtina Netewan de jî ji alîye Aburî ve hatîye dorlêgirtin. Em di bin zîneteke wetov dujwar de dijîn, ku em zor pêwistî bi yarmetîyê ne, him ji alîyê Miletê xwe ve û himjî ji alîyê Miletên seranserî Dunyayê ve. Em hêvîdarin, ku hûnê di vî wari de hinekî yarmetyaî me bidin kirin.

Xweşk û Birayên Xweşewist!
Em bi dostanîya we bextiyarin û em pê serbilindin. Em daxwaza bi serketina we didin kirin. Hêvîya meyi bilind eve, ku em tev de di nava Kurdistana xwe de bi Azadî, Serxwebûn, Xweşi û Bextiyari bijîn.

Birayên we Mesud Berzanî û Celal Talibanî